Dr Nûredîn Zaza
1919 - 1988

NEWROZ

Osman Sebrî
1905 - 1993

Xebat ji bo : * Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.
* Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.
* Mafên gelê Kurd yên netewî di çarçewa yekîtiya wel[êt de .

Ji *weşanên Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê ~ YEKÎTÎ*
Email : Newroz95@hotmail.com

Hejmar(76) Ç. Pêşîn 2007 z~2619 k Buha (15) p.s

Ji heftenameya Çawdêr re

Rojnama Çawdêr hevpeyvînekê bi Sekretêrê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê (YEKÎTÎ) Mihyedîn Şêx Alî re dike û li Silêmaniyê, di 12-11-2207 an de dewşêne.Eemê vê hevpeyvênê ji xwendevanê Nerozê re biweşênin:

1. Berhemên bizave neteweye kurd li rojavaye Kurdistan piştî kû 50 salîya xwe ya zêrîn derbas kir çîye...?

B1- Piştî 50-salî ji temen û xebata tevgera siyasî a kurd li Sûriyê , mirov dikare van nirx û berhemên jêrî bîne ziman:

a- Li Sûriyê, nemaze li herêmên kurdax, kobanî û cizîrê, kurdan serûber xwe naskirine ku kurdin, li ser axa bavbapîran dijîn , zimanê dê bi wan buhaye , ew parastine û pê dipeyîvin , ango , hestê netewî baş ciyê xwe girtiye , zimanê dê di civaka kurdan de zimanê sereke ye.

b- Rola tevgerê di pêşkeftina civaka kurd di warê zanyarî û xwendina bilind de , roleke berçav û xurt bû.

c- Tevgerê karîbû li cejina Newrozê bibe xwedî , û îro roj , Newroz di tevahiya civaka Kurd û Ereban de li Sûriyê ciyê rêz û hurmetê ye .

d- Bi xêra tevgerê , bi sedan mamoste û nivîskarên bi zimanê dê hatine holê.

e-Gelek rewşenbîr û siyasetvanên Ereb dostaniya gelê kurd dikin û bi çavên erênî li pirs û daxwazên tevgerê dinêhêrin û dibine piştgir.

e- Rewş û pirsa kurd li Sûriyê li ba gelek hêz , rêxistin û komeleyên mafên mirovan hatiye dannasîn.

2. Çire ta niha bizavê fişareke piraktîkî nexiste bo ser rijîma sûrîyê jibo danasîna nasnamê gelê kurd û çareserkirina pirsgirêka rewa…?

B2- Rijîma Sûriyê dûrî Demokrasiyê ye , û eve 44-salin siyaseta yek-partî tête ajotin û serdest e , lewre jî çareserkirina pirsa kurd hê neketiye rojevê . kurd û ereb li Sûriyê di zikê hev de ne , rewş, jiyan û berjewendiyên wan ji hevdû cuda nabin , loma jî, çendî heyameke demokratîk li Sûriyê bête peydakirin, ewqas kurd li karê ne , û pirsa wan ya netewî nêzî çareseriyê dibe. ⟶